

# KOMELEYÊN CIWANAN LI BERLIN

Landes Jugendring Berlin

# KOMELEYÊN CIWANAN ÇI NE?

Komeleyên Ciwanan komelene ku ji aliyê kesên ciwan ve hatine damezrandin .

li Komeleyên Ciwanan kesên ciwan bi hev re dicivin. Li wê derê bi hev re ji bo ciwanên din peşniyaran bi rêve dibin. Di nav de jî wek nimûne çûnên betlaneyan, seyran, odeyên karkirinê û tiştne din. Li Komeleyên Ciwanan zarok û ciwan bi hev re bi ciwanên din re demên valahiyê dirist dkin.

Tiştê herî taybet li komeleyên ciwanan ew e, ku zarok û ciwan çi bixwazin bikin biryara xwe bi xwe didin. Ew bi xwe pêşniyaran d'afirînin û wan bi cih tînin. Li Komeleyên Ciwanan, ciwanên ku guhdanên wan wek hev in tên ba hev. Bi hev re alîkariya kesên din dikin.

Ji bo hevkirinê jî pêwîst nake ku mirov endamê Komeleyê be.



# KOMELEYÊN CIWANAN DEVERNE KU ZAROK Û CIWAN LÊ



- xwe bi xwe bi rêve dibin,
- bi dlixwazî kar dikin,
- demên valahiyê xwe bi xwe bi rêve dibin,
  bi awayekî dîmokratîk bi hev re biryar didin,
- fêr dibin, çawa guhdanên xwe vehûnin,
- heger bixwazin jî dikarin beşdarî pêvajoyên sîyasî û civakî bibin.

# KOMELEYÊN CIWANAN ÇI DIKIN?

Komeleyên Ciwanan seranserê salê pêşniyaran ji bo zarok û ciwanan saz dikin:

- Ew serperiştiya zarok û komên ciwanan dikin.
- Ew pêşniyaran didin ber zarok û ciwanan.
- Ew navendên ciwanan, yaneyên ciwanan an qehwexaneyên ciwanan bi rêve dibin. Li wir zarok û ciwan dikarin hev bibînin û hevûdin nas bikin.
- Ew rêberên ciwanan perwerde dikin.
- Ew çandên cuda tînin ba hev.
- Ew hevdîtinan bi ciwanne din re jî li derveyî welêt pêk tînin.
- Ew beşdarî karê polîtîkê dibin.
- Ew xizmetên xwe bo jîngehê nîşan didin.
- Ew karên çandî saz dikin.
- Ew pêşnîyarên werzeşî saz dikin.
- Ew semînar û karên perwerdeyê pêşniyar dikin.

**Mînak li ser rûpelên dîtir in.**





# Projeya Urban Gardening bi ciwanên penaber re

Peywendiya bi baxçevanan re. Wilo diramiyan Ciwanên BUNDjugendBerlin û bi Ciwanên penaber re dest bi projeyeke bexçe-vaniyê a Urban Gardening li Zehlendorfê kirin. Li wir û bi hev re ciwan hewdan çê dikin û şitlên sebzeyan diçînin. Xala navendî a vî karî jî xweşikkirina wargehan û veguherîna danûstendinan bi hev re ye.

Ciwan li Berlinê bi pirrçandeyî mezin dibin û dijîn. Projeya hilbirîna nerînan a Komeleya Ciwanên djo-Keskesora Berlînê (djo-Regenbogen Berlin) nîşan dide çawa pirrengî civaka me zengîn dike. Li Zankoyan û kampên Medyayê Wêne û Vîdyoyên rengîn û cûr bi cûr pêk tên, an jî rojnameyeke li ser çîrokên ciwanên bajarên me ên pirr ji hev cuda.

## Hilbirînerên Nerînan







# Kampên serpêhatiyên Zarokan

Ji bajêr derkevin û berî bidin serpêhatiyê: Di bin vê diruşmê de serpêhatiyên zarokan ên kampên ciwanên Miroveyî li Berlînê (Junge Humanist_innen Berlin) ên ji 7 heya12 salan lidardikevin. A herî taybet ew e: zarokên ku ji malbatên xizan in an jî kesên ku pereyan li gor qanûna penaberxwaziyê distînin, dikarin bêberamber alavên veguhestinê bikar bînin.



## U28 berçavka ciwanan bo siyasetmedaran

Bi “U28 – siberoj dikene” yekitiya ciwanên elman ên katolîk dixwazin siyasetmedaran bighînin baweriyekê, ku biryarên xwe ên siyasî li gor boçûnên Zarok û Ciwanan ber bi çav bînin. Siyasetmedar divê ku bi bîr bînin dê biryarên wan çi karvedanan li ser Zarok û ciwanan bihêlin.

Li cîhên konvedanê di orteya komên qûmê de li ser girava Deryaya Bakur Sylt her sal zarok Komara xwe a taybet radighînin – Komara Zarokan. Zarok li gor pilana bernameya Betlaneyê xwe tevlî vê çalakiyê dikin û wê dûra bi hev re. Li wir wekî din gelek pêşniyar û çalakî hene: Sporên li ser peravê û di deryayê de, gera li nav Deryaya herîyane, menqel û gelek tiştên din. Pêşniyareke karên Ciwanên welêt Kombenda Karkeran (AWO).

## Komara zarokan a Syltê





# NAVENDÊN DEMÊN VALAHIYÊ ÊN CIWANAN

Li yane û navendên ciwanan Zarok û Ciwan dikarin demên Valahiyên xwe derbas bikin.

Li navenda ciwanan LUKE a şopgera Federal li Elmanyayê (BDP), kesên ciwan dikarin hev bibînin, li Mozîkê guhdar bikin, bi tênisê an bi Bilyardê bilîzin. Li gel vê jî gelek komepêşniyar hene wek nimûne fûtbol, govend, xwarinçêkirin an alîkariya karê navmalê. Wekî din stûdyoke Mozîksaziyê heye.



Odeya dengsaziyê, stûdyoyên Koman, biskilêtsazîxane bi tenê hin pêşniyar in ji gelekan ên Navenda Ciwanên Betoniayê a bi ser xeleka zarokên Berlînê ve ye e. V. û bêguman li wir jî "devereke vekirî" heye ku tê de zarok û ciwan hevûdin bibînin û bi hev re demên pişt nîvroyê derbas bikin.

Ji bilî van herdû Mînakan hîn gelek yaneyên ciwanan ên din jî li Berlînê hene. Bo zanyarên bêtir li ser vê pêveka online bitekînin https://jup.berlin/location_map.



# KÎJAN KOMELEYÊN CIWANAN HENE?

Ev Komele hene

- → Komeleyên tîrebazî (bo nimûne Ciwanên Misilman, Ciwanên êvangêlî, Ciwanên Federasyona
- → Elmanyayê ên katolîk an ciwanên Elewiyan)
- → Ciwanên werzeşê
- → Kemeleyên Ciwanan ji bo sazkirina alîkariyê (wekî mînak Ciwanên THW/Ciwanên AlîkariyênKarênTeknike, Ciwanên agirkuj an Ciwanên Xaça Sor)
- → Komeleyên ciwanan ku ji bo parastina Jîngeh û xwezayê dixebitin (bo nimûne Ciwanên hevgirtî)
- → Komeleyên ku berî her tiştî bi awayekî navnetewî û pirrçandî dixebitin (wekî mînak djo-Regenbogen Berlin/Keskesora Berlînê û Junge Europäische Bewegung/Tevgera ciwanên Ewrupayê)
- → Komeleyên Ciwanan ên miroveyî an siyasî (bo nimûne Ciwanên Sosyalîst yên Elmanî – Ciwanên Baz, Ciwanên mirovperwer, Ciwanên demoqrat, Ciwanên çepgir an Ciwanên Xwezaparêz).



Li kêleka vê yekê hilbet hîn gelek xwestin hene ku bi riya rêxistinên ciwanan tên nîşandan:

Torbenda Ciwanan Lambda rêxistineke ciwanan e ku ji bo gay, lêzbiyen, bîsêksiwêl, trans û intersêksiwêl*, û Ciwanên queere (LSBTIQ*) li Berlîn û Brandenburgê dixebitin.

Çapemeniya Xortan komeleyeke bo ciwanên ku bi medyayê re mijûl in. Mînakeke din Amaro Foro ye, rêxistineke ciwanan ji Roma û Ne-Roma an KOMCIWAN a Berlînê, komeleyeke bo zarok û ciwanên Kurd e.



Agahdariyên giştî li ser Komeleyên Ciwanan ên Berlînê li ser rûpela me ya online: www.ljrberlin.de hene.

Di Xelekên Ciwanên welêt ên Berlînê de Komeleyên Ciwanan ên Berlînê li hev dicivin. Niha 33 Komeleyên Ciwanan endamên Xelekên Ciwanên welêt in li Berlînê.





# KESÊN KU LI KOMELEYÊN CIWANAN XEBATÊN CIWANAN PÊŞKÊŞ DIKIN KÎ NE?

Pirraniya kesên ku kar û barên ciwanan dikin bi awayekî xêerxwaz-yane dikin. Berî her tiştî Mirovên ku li Komeleyên Ciwanan kar dikin bi salan û bi awayekî dixwazyane dixebitin.



Kesên din ên ku di kar û xebatên ciwanan de çalak in, di vî warî de perwerde bûne. Bi giştî wan ji bo wilo xwendine an jî perwerdehiya pêdagogiyê bidawî kirine. Li gel Karmendên bingehîn ên komeleyên ciwanan kesên wekû hêzên rumetê jî alîkariyê dikin .

Kesên ku li Komeleyên Ciwanan kar dikin, li her tiştê ku li wê deverê ne miqate ne, Zarok û Ciwan dikarin hema riya xwe bi wan xînin û tevlî Pêşniyaran bibin.

Gelek karmendên rûmetê li Komeleyên Ciwanan bi riya kûrseke perwerdehî fêr bûne çawa mirov û bi çêtirîn şêwe bi zarok û komên ciwanan re danûstendinê bikin.

Juleica ji bo Karta Rêberên Ciwanan amade ye. Juleica tê wergirtin, tenê eger mirov beşdarî perwerdehiya bi naverokên qanûnî û pêdagogî bi qasî 40-saetî bûbe, û kûrsa alîkariyên pêşîn bi dawî kiribe û bi awayekî xêrxwazyane di rêxistineke ciwanan de beşdar bûbe.



# KOMELEYÊN CIWANAN JI KU PEREYAN WERDIGRIN?

Kesên ciwan mafê wan heye ku li gor guhdanên xwe berê xwe bidin pêşniyaran û karibin wan bi xwe şêwe bikin. Ji ber vê yekê rêxistinên ciwanan ên li wan ciwan bi hev re divin pereyan ji dewletê werdigrin.



Herwiha kar û xebatên Komeleyên Ciwanan bingeheke wan î qanûnî jî heye. Ew di Qanûnnameyên civakî de VIII hatine sazkirin.

Komeleyên Ciwanan wekî din kar û xebatên xwe bi riya alîkarîdanê fînanse diki. li hin rêxistinên Ciwanan endam pereyên endametiya xwe didin. Hinek peşniyar wek mînak azademên Betlaneyan bi beramber in. di heman demê de gelek rêxistinên ciwanan jî kêmkirina Bihayan pêşkêş dikin.

Her wilo gelek pêşniyar li komeleyên ciwanan bê beramber in û biserûber pêk tên!

Weşanger:
Landesjugendring Berlin e. V.
Obentrautstraße 57 | 10963 Berlin
030 818 86 100 | info@ljrberlin.de
www.ljrberlin.de
landesjugendring.berlin

Berprisiyar (i. S. d. P.): Tilmann Weickmann
Serrastkirina nivîsan: Jaqueline Kauka
Şêwesazî: WEBERSUPIRAN.berlin
Çap: trigger.medien.gmbh

© 2017 Landesjugendring Berlin e. V.

Jêderên wêneyan: © Tim Lüddemann/LJW der AWO Berlin (Rûpelên 1, 11); © BDP Berlin (Rûpel 3); © BUNDjugend Berlin (Rûpel 5); © meinungsmacher.in/ djo-Regenbogen Berlin (Rûpel 6); © Junge Humanist_innen Berlin (Rûpel 7); © BDKJ Berlin (Rûpel 8); © Jugendwerk der AWO Württemberg (CC-by-sa-3.0, Rûpel 9); © LJR Berlin (Rûpelên 13, 15); © Marion Hunger (Rûpel 17)

Ev Belavok di çarçoveya projeya “Vom FÜR yum MIT” ji Landesjugendring Berlin/ Xelekên Ciwanan ên Navçeya Berlînê hatine lidarketin. Hatiye fînansekirin ji aliyê:

Bundesministerium
für Familie, Senioren, Frauen
und Jugend

# BEŞDAR BE!

Tu ji bo çi guh dide vê yekê ? Teqez rêxistineke ciwanan li Berlînê heye, ku li wir tu dikare mirovên ciwan ku wekî te guh didin heman tiştan bibîne!

Komeleyên Ciwanan zanyariyan bo pêşniyarên xwe li ser Malperên xwe, di riya Facebookê, herwiha di riya roznameyên civanan ên xelekên ciwanên welêt li Berlînê werdigrin.

Bo ku beşdarbûna pêşniyarên Komeleyên Ciwanan, pêwist nake ku Mirov endam be.

Li vir hin pêvek hene bo nasîna hijmarên rêxistinên ciwanan li Berlînê:
http://www.ljrberlin.de/landesjugendring/mitglieder
http://www.ljrberlin.de/jugendmigrationsbeirat

Tu dikarî ji me re rasterast bipirse!
Telefonê me bike an ji me re E-mail bişînin!

030 818 86 100
info@ljrberlin.de